



2013 Roja Şanoyê a Cîhanê
Peyama Dario Fo

Beriya niha ji zû ve, pergalê lîstikvanên *Commedia dell'Arte* ku ji hebûna wan aciz in, biryar hat dayîn; bera wan dan, ew ji welat qewirandin.

Îro lîstikvan û komên şanoyê neçar dimînin ku sehne, salon û temaşevanan bibînin. Hemû sedem krîz e.

Ji ber vê yekê, xwedyê pergalê kûr û kûr henekên xwe dikin û êdî eleqê xwe ji kesên ku dixwazin dengê xwe derxînin nayînin. Di ser de, ne war û welatekî lîstikvanan, ne jî girseyeke gel ku dengê xwe bigihînin wan heye. Li Ronesansa Italya, tam berevajî, xwedyê pergalê mecbur bûn ku *Commedianti* di quncikê de asê bikin; ji ber ku bi girseyan temaşevanên wan hebûn.

Tê zanîn ku derketina mezin a welat ya lîstikvanên *Commedia dell'Arte* di sedsala dij-reformasyon pêktê. Wê demê emir hat dayîn ku hemû holên şanoyê bîn valakirin. Bi taybetî ev li Romayê bû. Bi hinceta ku şano zirar dida pîroziya wî bajarî dihat suçdarkirin. Papayê 12. di sala 1697'an de, bi zextên kevneşopiyên burjuvaziyê û bi piraniya çîna ruhban, emir da ku Şanoya Tordinona xira bike. Nobedarê exlaqê îdea dikirin ku xwepêşandanên herî şerm li wir derdiketin ser sehnê.

Di heyama dij-reformasyonê de kardinal Carlo Borromeo ku ji bo gel "Zarokên Milano" gotiye, hewldana xwe li Bakurê Italya zêdekiriye, ji xwe re kiriye armanc ku wan ji gunehan rizgar bike.

Di çavên wî de di navbera hûner û şanoyê de cûdahiyê mezin heye: Yek, qedemeya yerî bilind a perwerdeya giyanî, dû, berê xwe dayîna ego û bi karên pûç re lebikandin. Di nameya ku ji hevkarên xwe re şandiye nêrînen xwe wiha tîne zimên: "*Me ji xwe re kiriye dert ku koka wî giyayê bi zirar biqelînin. Ji bo em wan tekstên ku axaftinên rezîl vegotîne bişewitînin çî ji me hatiye me kir. Me hewl da ku em hemûyan ji hişên mirovan derxînin. Em ketin pey wan kesên ku nivîsên wisa dane çapê. Lê wisa xuyaye, em hîn hişyar ne bû yî, şeytan bi qurnazî xebitiye. Tiştê ku bi çav tê ditîn, li ber tiştên di pirtûkê de tê xwendin, çendîn dikeve kurahiya giyan! Bi peyva ku ji dêv derketiye û hewldana ku lê tê, di hişê zar û keçên kamil de, xirabiya ku tê kirin, li ber peyvên mirî ên di pirtûkan de çî ne ku. Ji ber vê yekê, çawa ku em bajarê xwe ji giyanên ku nayên xwestin paqij bikin, divê em ji kiryarên şanoyê jî paqij bikin."*

Wisa xûya ye ku, ji bo ji krîza rojane rizgar bibin, hêvî ew e ku li hember me kampanyayê mezin were lidarxistin. Bi taybetî divê ev seferberî li hember mirovên ciwan ku dixwazin hûnera şanoyê hîn dibin bibe. Di encamê de, dîasporaya *Commedianti* ya ku ji karkerên şanoyê yên ku hatine qewirandin dê bê afirandin, bêguman ji van zextan wê feydeyên ku nakeve aqilan, wê xwepêşandan û lîstikên nikûnû biafirînin.